



BULTENA ÇANDINIYÊ YA HDP

Bedêla polîtîkayên çandiniyê yên ku pêşikî dide sermiyandaran cotkar didin !

- Li gundê Yaşyer a Mîlas a Mûgla'yê, cotkarekî bi navê Fahrettîn Aktaş, ê 50 salî û bavê du zarokan, di 5'ê Gulanê de ji ber ku nikaribû deynên xwe bide xwe kuşt. Di notê de ku Fahrettîn Aktaş li pey xwe hişt ev nivîsandibû: “Êdî dilê min vê bêrûmetiyê nagire, tevî traktora min çiyê min hebe bifiroşin û deynên min bidin”.

Buhayên xurekan di salên dawî de gihîştine asta herî jor!

- Li gorî endeksa FAO'yê (Rêxistina Xurek û Çandiniyê) ev nêzî salekê ye li hemû dinyayê buhayên xurekan hertim zêde dibin. Li gorî endeksa buhayên xurekan a FAO'yê, bi mehane, buhayên xurekan di meha Nîsanê de ji sedî 1,7 zêde bûne û bi salane jî ji sedî 30,8 zêde bûne. Di meha Nîsanê ya 2020'î de endeksa buhayên xurekan ya ku 92,4 bû di meha Nîsanê ya 2021'ê de derketê 120,9 an.
- Li gorî endeksa fiyeten a FAO'yê;
 - Endeksa buhaya dexl û zadan di meha Nîsanê de ji sedî 1,2 zêde bûye û bi salane jî ji sedî 26 zêde bûye.
 - Endeksa buhaya rûnê riwekî di meha Nîsanê de ji sedî 1,2 zêde bûye.
 - Endeksa buhaya hilberên şîremenî bi mehanê ji sedî 1,2 û bi salane jî ji sedî 24,1 zêde bûye.
 - Endeksa buhaya hilberên goştî bi mehane ji sedî 1,7 û bi salane jî ji sedî 5,4 zêde bûye..
 - Endeksa buhaya şekiran bi mehane 3,9 û bi salane jî ji sedî 60 zêde bûye.

Her ku malîyetên lêçûnên çandiniyê zêde dibin fiyeten xurekan jî zêde dibin!

- Buhayên gubre, bi salane, li gorî TUIK'ê ji sedî 36,21, li gorî Wezîriya Çandinî û Daristanan ji sedî 51,59, û li gorî Yekîtiya Odeyên Çandiniyê yên Tirkiyeye'yê jî ji sedî seriya 75 an zêde bûye. Gelo ji van rêjeyên cûr bi cûr kîjan rast e? Mixabin, der barê zêdebûna buhaya gubreyê de, mêjera ku cotkar dibejin ji rêjeyên van her sê saziyan jî zêdetir e. Li gorî cotkaran bi salane buhaya gubreyê herî kêr ji sedî sed zêde bûye û hîn jî ber bi zêdebûnê ve diçe.
- Li gorî TUIK'ê di meha Adarê de Endeksa Buhaya Lêçûnên Çandiniyê, bi mehane ji sedî 1,33, bi salane ji sedî 21,3 zêde bûye û ev fiyet di 26 mehên dawî de ya herî bihaye.

- Biryarên ku ji bo pêvajoya qedexeya derketina kolanan a bi 17 rojan a ku ji serê meha Gulanê de destpêkir de hatin girtin dikandar, bazarvan û cotkaran ne parastin lê şirket û marketên mezin parastin Di vê pêvajoyê de cihên bazarê hatin girtin û bi vê yekê re rêya ku gel digihe xurekên tendurist û erzane hate birrîn. Mirov mecbur man ku xurekên xwe bi buhayên gelek zêde ji marketên mezin bikirin û lazimatîyên xwe yên jînî dabîn bikin.

- Avakirina cihên bazaran a li qadên vekirî di şert û mercên pandemiyê de bi awayekî ewletir û guncaw îmkana pêşkeşkirina xurekên erzane dide mirovan, ji ber vê yekê biryara girtina cihên bazaran di warê aborî û tenduristiyê de gelek aloziyan berda nava civakê û nelirêtiyên cidî derxist holê. Ji ber ku cihên bazaran girtibû hilberên cotkaran di destê wan de man û pûç û kurmî bûn.

- Di meha Gulanê de jî AKP'ê dîsa çav û guhên xwe li pirsgerêkên girt û di vê mehê de li gelek waran cotkaran nerazîbûnên xwe nîşan dan. Ji ber zêdebûna malîyeta lêçûnan, deyndarî, kêmbûna buhayên hilberên çandiniyê û ji ber di destdemayîna hilberan de cotkaran nerazîbûnên xwe anîn ziman.

Hilberînerên çayê kota ya ku li buhaya standinê ya ÇAYKUR protesto kirin!

- Hilberînerên çayê, ji ber ku ÇAYKUR di sala 2021'ê de li buhaya standina çayê kêmkiriyê û kota li buhaya standinê aniye nerazîbûnên xwe anîn ziman û vê yekê protesto kirin. ÇAYKURê ji bo sala 2021'ê buhaya kiloya çaya şîn wekî 3,87 lire diyar kiribû û tevî destekkirinan ev reqam serê kiloyê digihaşt 4 lireyan. Her çiqas ev buha ji aliyê AKP'ê ve wekî buhaya kêmtirîn hatibe diyarkirin jî, sektora arizî kiloya çayê bi navînî bi 2,80 lire distîne. Li gorî cotkaran encax kiloya çaya şîn herî kêmtir bi 4,5-5 lire bêt standin wê dikaribin destheqê keda xwe bigirin.

Kotaya ÇAYKUR'ê a "rojê herî zêde 15 kilo bêt standin" hilberînerên çayê mehkûmê sektora arizî a kedxwar dike û ev yek hilberîneran dixê zorê.



Çavkanî: Rojnameya Karınca

- Di sala 2021'ê de, li gorî sala borî, buhaya standina çaya şîn ji sedî 17,63 zêde bû lê ev rêjeya zêdebûnê li ber zêdebûna malîyetên wekî gubre, meqesa çaybirinê û destheqên karkeran ne tu tiştek e, cudahiya di navbera zêdebûna dahatan û zêdebûna lêçûnan de gelek e û kar û zirara cotkaran hev û din dernaxe.
- Li Herema Deryaya Reş a Rojhilat, 214 hezar hilberîner li ser 835 donim erdî çandiniya çayê dikin. Ji sedî 65,5 ê erdên ku li ser çay tê danîn li Rîze'yê, ji sedî 19,5 li Trabzon'ê, ji sedî 11,5 li Artvînê û ji sedî 2,5 li bajarên Gîresûn û Ordû'yê ne.

Li Gorî Bajarên Erdên ji bo Çaydanîyê û Hejmara Hilberîneran (2019)

Bajar	Hejmara Hilberîneran		Erdên ji bo Çaydanîyê	
	Hejmara Cotkaran	Donim	Donim	%
Rize	132.264	61,8	555.125	66,5
Trabzon	51.600	24,1	162.493	19,5
Artvin	20.398	9,5	96.290	11,5
Giresun-Ordu	9.921	4,6	20.992	2,5
Tevayî	214.183	100	834.900	100

- Lî Deryaya Reş a Rojhilat, çandiniya çayê bi piranî ji aliyê firmayên biçûk ên malbatî ve tê kirin. Mezinahiya firmayan serê hilberînerê bi navînî li dora 4 doniman e. Ji sedî 72 ê hilberîneran xwediye binî 5 donim, ji sedî 22,5 xwediye 5-10 donim, ji sedî 5 xwediye 10-20 donim û ji sedî 0,4 xwediye xwediye seriya 20 donim erdê çay in.

Dabesîya Erdên ji bo Caydanîne ya li Gorî Heimara Hilberîneran (2019)				
Mezinahiya Fîrmayê	Heimara Hilberîneran	Rêje (%)	Erdên ji bo Caydanîne	Rêje (%)
0 – 5	144.203	72,2	362.414	46,1
5 – 10	45.013	22,5	285.100	36,3
10 – 20	9.578	4,8	117.183	14,9
20 +	851	0,4	20.996	2,7
Tevayî	199.645	100,0	785.693	100,0

Çavkanî: ÇAYKUR

Miqdara Çaya Sîna li ÇAYKUR û Sektora Arizî Standê (hezari ton)					
Sal	ÇAYKUR	%	Sektora Arizî	%	Tevayî
2010	590	45	715	55	1.306
2015	681	52	637	48	1.319
2016	687	53	611	47	1.299
2017	525	41	746	59	1.271
2018	733	50	742	50	1.474
2019	750	53	655	47	1.40
2020	752	52	692	48	1.445

Çavkanî: Rize Ticaret Borsası (2021)

- Li Tirkiye'yê di salê de nêzî 270-280 ton çay tê mezaxtin. Ji vê mîqdarê 135 ton ÇAYKUR, 125 ton sektora arizî û 35 ton jî ji aliyê firmayên biyanî tèn peydekirin.

Bazara Jiyan a Mehelî di Hedefe Qeyûm de ye!

Bazara Jiyan a Mehelî ya ku ji aliyê Şaredariya Mezin a Amedê li navçeya Rezan tê danîn yekem bazar e ku bi temamî bi keda jinan tê avakirin. Şaredariya Rezan a ku bi hişmendiya qeyûm dest li ser hat danîn gelek caran hewl da ku keda jinan xesp bike. Qeyûmê ku çavnebariya keda jinan a li bazarên mehelî dikin hewl didin ku karaktera bazara Jiyanê biguherînin û bikin wek bazara mêran, lê belê ev hewldan bi berxwedana jinên bazarvan hate astengkirin. Zabitayên qeyûm gefan li jinên bazarvan xwarin û bi tehdîtan, serê dezgehê 1500 lîre, bi tevayî 204 hezar lîre ji jinên bazarvan berhev kirin. Bi ser de, hişmendiya qeyûm ev pere di bin navê bexşdayinê de bi rêbaza xerac girtinê hate berhev kir. Bazarvanên jin ên Bazara Jiyanê her çiqas bikevin tengasiyê û bi rojên zor û zehmet re rû bi rû bimînin jî di vê qeyrana aboriyê de ji têkoşîna xwe gavek paş ve neavêtin.



Çavkanî: Rojnameya Karinca

Hejmara cotkarên ku Roja Cotkaran a Cîhanê pîroz dikin sal bi sal kêm dibe!

Bi mebesta 14'ê Gulanê Roja Cotkaran a Cîhanê, dema em bala xwe didin rewşa cotkaran tê dîtîn ku weziyata wan qet ne dilxweşker e. Li gorî IMF'yê, di nava 25 welatê di bin geşiyê de, Tirkiye 23'yemîn dewleta ku herî zêde piştgirî dide cotkarên xwe ye an go ji paş ve di rêza 3'yemîn de ye. Ji ber qeyrana aboriyê û ji ber şert û mercên pandemiyê, li Tirkiye'yê cotkar hema bêje hatine jibîrkirin. Girêdayî dowîza ku roj bi roj zêde dibe, malîyetên lêçûnan jî zêde dibin. Buhayên hilberên çandiniyê zêdebûna malîyetan pêgînî nake û bi ser de pêkhatina zîwayiyê mexdûriya cotkaran yekcar kûr dike. Ji ber vê yekê di 14'ê Gulanê Roja Catakaran a Cîhanê de cotkaran dêvla ku roja xwe pîroz bikin mixabin mexdûrî û pîrsgirêkên xwe diyar kirin.

Li gorî daneyên Saziya Ewlehiya Civakî (SGK), di sala 2011'an de hejmara cotkarên ku bi ser navê cotkariyê sîgortedar bûn, 1 mîlyon û 121 hezar û 777 bû, di sala 2020'î de ev hejmar heta 547 hezar 75'an ketiye. Pergala Qeydkirina Cotkaran (ÇKS), di sala 2017'an de, hejmara cotkarên qeydkirî wekî 2 mîlyon û 100 hezar diyar kiribû, lê di salên pey de derbarê vê hejmarê de êdî tu daneyek bi raya giştî re parve nekirin. Lêbelê li gorî Bûltena Şopandina Xebitandinê ya ku Weqfa Lêkolîna Polîtîkayê Aboriyê ya Tirkiyeyê (TEPAV), daneyên SGK û IŞKUR'ê yên yên Cotmeha 2020'an dinirxîne û amade dike de, di meha Tebaxê ya 2020'î de ev hejmar ketiye û bûye 1 mîlyon û 803 hezar.

- Ofîsa Mehsûlên Axê (TMO) buhayên kirîna dextl û beqlîyatan yê ji bo sala 2021'ê diyar kir. Buhaya tona genimê sor/sipî yê bikalîte yê ji bo nanê hişk wekî 2250 lîre, tona ceh û çewder wekî 1750 lîre, tona xamkêsan wekî 1900 lîre û tona genimê ji bo miqarne jî wekî 2450 lîre hatiye diyarkirin. Herwiha TMO buhayên standina beqlîyatan jî diyar kir; tona nîskê sor bi 5 hezar lîre, tona nîskê kesk bi 4 hezar û 150 lîre û tona nokê jî bi 4 hezar û 50 lîre ji aliyê TMO'yê tê standin. Dema em qeyrana aboriyê, pandemiyê, zêdebûna dowîzê û rabûna malîyetên lêçûnan bidin ber çavan ev yek aşkere ye ku buhayên ku TMO diyar kir cotkaran dilxweş nake. Dema ku TMO buhaya dextlan diyar kir li Rihayê tonekî ceh bi 2260 lîre dihat firotin. Di navbera buhaya ku TMO diyar kir û buhaya ku li Borsaya Rihayê derketibû holê de ferqekî bi qasî 500 lîre hebû, ev yek dide ber çavan ku buhayên standinê yê ku TMO diyar kir çî qas dûrî piyaseya emtiayê ne. Di meha Tebaxê ya 2021'ê de, TMO li aliyekî tona cehê bi 2000 lîre îtxal dikir û li aliyê din jî buhaya cehê xwecîhî wekî 1750 lîre diyar kir. Ev mînak jî careke din dide berçavan ku TMO çiqas ji rastiya piyaseyê dûr e. Li gorî buhayên ku TMO diyar kir, buhaya genim serê kiloyê 60 quriş zêde dibe lê li aliyê din di carekî te 67 quriş zem tê ser lîtreya mazotê, ev yek jî aşkere dike ku cotkar çî qas dûrî bidestxistina heqê xwe ne. Ji bilî vê, cotkar peryên pesartinê salek şûnde distînin lê dema ku hemû lêçûnan bi bihayên zemkirî distînin. Li gorî vê hesabê ji bo ku cotkar lîtreya mazot bistîne divê 3,3 kîlo genim bifiroşe. TMO plan dike ku tona genimê ji bo nan a ji gruba duyemîn bi 2250 lîre bistîne û bi 2450 lîre bifiroşe, her wiha plan dike ku tona genimê ji bo miqarne bi 2650 lîre û tona ceh jî bi 1950 lîre bifiroşe.

Fiyetên ku TMO ji bo Satandina Dextl û Beqlîyatan Diyar Kiriye, 2021

Cisnê wî		bihayê kirinê (TL/Ton)
Genimê ji bo Maqarne	Genimê ji bo Miqarneyê (sefa 2'yem)	2.450
	Genimê ji bo Miqarneyê ya bi kalîteya kêmevar	2.200
Genimê ji bo Nan	Sert ekmeklik buğday (2.sınıf)	2.250
	Genimên Din ên ji bo Nan (sefa 2'yem)	2.200
	Genimê ji bo Nan ê bi kalîteya kêmevar	2.050
Ceh		1.750
Cewder		1.750
Xamkêsan		1.900
Nîskê Sor (sefa 1'em)		5.000
Nîskê Kesk (sefa 1'em)		4.150
Nok (sefa 1'em)		4.050

Çavkanî: Ofîsa Mehsûlên Axê (TMO)

Ziwayî elarim dide!


Di vê pêvajoya ku di 50 salên dawî de barana herîş kêmbariyaye de Yekitiya Odeyên Çandiniyê ya Tirkiyeyê rapora ziwayiyê amade kir. Li gorî vê rapora ziwayiyê;

- Di pêvajoya di navbera 1'ê Cotmeha 2020'î û 30'yê Nîsana 2021'ê de, li gorî sala borî, baranbarîn li Herema Anatolyaya Navîn ji sedî 20,30, li Herema Anatolyaya Başûrê Rojhilat ji sedî 46,5, li Herema Deryaya Sipî ji sedî 31,5, li Herema Anatolyaya rojhilat ji sedî 27,5 û li Herema Deryaya Reş ji sedî 7,6 kêmbûye.
- Di serê meha Gulanê de hejmaraya bajarên ku ji ziwayiyê bandor girtine ji 21'an derkete 41'an.
- Hilberên ku herî zêde ji ziwayiyê zirarê dîtin ceh, genim û nîsk in.
- Tê texmîn kirin ku ji ber ziwayiyê wê rekolteya genim 18 mîlyon ton, ya ceh 7 mîlyon ton û ya nîskê jî wê biniya 250 hezar ton be. Dîsa tê texmîn kirin ku ji ber ziwayiyê wê zaiyata rekolteya genim bi qasî 2 mîlyon ton be.

DOKTAR lêkolîna xwe ya bi Sernavê 'Nebza Cotkaran' weşande.


Li gorî encamên lêkolîna ku DOKTAR (Dixtorê Çandiniyê) ya ku di meha Mijdara 2020'î de li 81 bajar û 464 navçeyan bi 3000 hezar hilberîneran re pêk anî;

Di sala 2019'ande, guherbariya erdên çandiniyê ya li gorî grûbên hilberan




Li gorî sala 2019'an, di sala 2020'î de rêjeya cotkarên ku erdên wan ên çandiniyê hindiktir bûne ji rêjeya cotkarên ku erdên wan ên çandiniyê pirtir bûne zêdetir e.

Di navbera salên 2019 û 2020'î de, guherbariya erdên çandiniyê ya li gorî dahatên cotkaran



Rêjeya kêmbûna erdên çandiniyê yên cotkarên bi pîvanga biçûk ji rêjeya kêmbûna erdên çandiniyê yên cotkarên bi pîvanga mezin zêdetir e.

Li gorî sala 2019'an guherîna dahatên cotkaran



Li gorî sala 2019'an, di rêjeya dahatên cotkaran ya li gorî mezinahiya dahatan de guherînek cidî heye. Rêjeya firotina hilberan nîşan dide ku piştî palehiyê hilberên ku cotkarên bi pîvanga mezin difiroşin ji yên cotkarên bi pîvanga biçûk pirtir in.

Dabeşiya sê pirsgirêkên sereke yên ku cotkar di hiberina çandiniyê de rû bi rû dimînin

Rêjeya cotkaran, ji sedî	Tirkiye	Zebze û Fêkî	Dexl û zad	Pişesaziyî
Zêdebûna maliyetên lêçûnan	73	69	74	79
Pirsgirêkên Elektrîk û Avê	19	19	18	22
Kêmbûna Fiyetên Firoştinê	10	10	10	10
Têrnekirina Pesartinan	9	8	11	9
Şert û Mercên Avûhewayê	9	6	12	7
Pirsgirêk tuneye	6	6	7	4
Ziwayî	4	4	4	7
Neditina bazarê	4	7	2	3
Mesrefên karkeriyê	3	4	2	3
kêmbûna karkeran yên din	3	5	2	2
	15	22	9	13

Pirsgirêka sereke ya ku cotkar di hiberina çandiniyê de rû bi rû dimînin, li gorî yên din bi ferqeke mezin, maliyeta lêçûnan e.

Hilberên Çandiniyê yên Demsalî yên Meha Gulanê



Fiyetên çend hilberên vê demsalê

Hilber Kg	Lî Zeviyên Mersînê	Lî Hala Mersînê	Lî Ser Dezgeh Mersîn	Hala Stenbolê	Lî Ser Dezgeh Stenbol
Kartol	0,25-1 TL	1,25-2 TL	2-3 TL	3-5 TL	5-7 TL
Fasûliyên Şin	2 TL	3-5 TL	5-7 TL	5-7 TL	8-12TL
Mîimîj	4-6TL	6-8 TL	8-12TL	8-10 TL	12-15TL
Dolmîk	0,50-1,5 TL	1-2 TL	3-5 TL	5-7 TL	6-8 TL
Xiyar	0,50-2,5 TL	1-3,5TL	2-5TL	1-5 TL	4-6 TL
Sîr	5-10 TL	10-20 TL	15-25 TL	15-30TL	20-50 TL
Tûfiringî	2,5-5TL	3,5-7 TL	7-15 TL	7-15 TL	10-20TL

Not: dibe ku fiyetên hilberan li gorî bajaran û li gorî kalîteya xwe biguhere.